## Cejna Remezanê pîroz be!

Cejn rojên girîng in ku deriyên qencî, dostî û aştiyê vedikin. Di vê serdemê de ku li cîhanê, Rojhilata Navîn û Tirkiyeyê aloziyên dîrokî diqewimin, divê em ji her demê bêtir xwe bi aştî, yekîtî, wekhevî û edaletê bigirin. Îsal Cejna Remezanê û Newroz li hev dicivin û em du cejnan bi hev re dijîn. Em hêvî dikin ku ji bo welatê me, herêma me û mirovahiyê jiyan li hember mirinê, heq li hember neheqiyê, aştî li hember şer û pevçûnê bi ser bikeve.

Em wekî mirovên xwedî nasname, bawerî û çandên cuda em dikarin bi hev re jiyaneke wekhev, adil, azad û demokratîk bi dest bixin. Rêya bidestxistina vê yekê avakirina Komara Demokratîk ji bo Tirkiyeyê û avakirina Rojhilata Navîn a Demokratîk ji bo herêmê ye. Em bawer dikin ku em ê bi gavên hevbeş ên ku dê di Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de bên avêtin, hinekî din nêzîkî aştiyê bibin. Bi vê baweriyê, em Cejna Remezanê li 86 mîlyon welatiyên xwe pîroz dikin. Em hêvî dikin ku ev cejn ji bo her kesî aştî, azadî û wekheviyê bîne.

**Tülay Hatimoğulları - Tuncer Bakırhan**
**Hevserokên Giştî yên Partiya DEMê**